

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



"ZAROK FÊKIYE MALANE"




HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND

ÇIROK Û MESELÊN XWE

JI WERE BÊJIN

KULÎLK


MİRİŞKA HANNA



Rojek ji rojêن havînê bû. Mirîška Hanna
libek genim dît û bû qîrîna wê:
-Ez ê vê liba genim biçînim !

Mirêşkê ji werdekê pirsî :

-Tu dixwazî alîkarîya min biki, ji bo
çandina vê liba genim ?



Werdekê got:


-na xêr,ez nikarim.

Mirîşkçû cem Qazê û jê pirsî:

-Tu dixwazî alîkarîya min bike,ji bo
çandina vê liba genim ?

Qazê got :

-Na xêr,ez nikarim.




Mirîşka Hanna çû cem Pisîkê û jê pîrsî:

-Tu dixwazî alîkarîya min bikî, ji bo vê
liba genim biçînim ?

Pisîkê got :

-Na xêr, ez nikarim.





Mirîşk çû cem Beraz û jê pîrsî :

-Tu dixwazî alîkarîya min bikî, ji bo vê
liba genim biçînim ?

Beraz got:

-Na xêr, ez nikarim.

(Dûmahîk heye)

RÊYA RAST BİBİNİN!



QUNCIKA DİROKA EDEBYETA KURDÎ

AHMEDÊ XANÎ (1)

Sala daykbûna Ahmedê Xanî ne aşkereye. Bi gotina Aladin Sicadîn, Ahmedê Xanî "ser-taca nivîskar û şayirên kurdan e" li tarîxa lîteratûra kurdan da dinivîsin, ku Ahmedî Xanî berî gişka ala xwerûya serxwebûna kurdan, ala yekitî û hevkariya qebîle û eşîrên kurdan bilind kir bo xatirê sazkirina dewleta kurdan. Di derheqa wê yekê dâ A.Xanî awa nivîsiye:

"Ger hebûya me îtifaqek,
Vêkra bikira me înqîyadek,
Rom û ereb û ecem temamî,
Hemîyan ji mera dikir Xulamî,
Tekmîl dikir me dîn û dewlet,
Tehsîl dikir me hukmet,
Temîr dibûn ji hev miqalet,
Mumtaz dibûn xudan kemalet."

Aleksadir Jaba destnivîsarên "Mem û Zîn" a A.Xanî bi zimanê fransizî di kovara "Mêlanjê Asiâtîk" di cildê 3-da çapkir.

Cara pêşîn li sala 1920-da "Mem û Zîn" li Stembolê hat çap kirin. Lê hukûmeta Tirkan ew kitêb şewitandin. Berî wê çapkiranê "Mem û Zîn" di sala 1898-da parça-parça li kovara "Kurdîstan" êda hatine çapkiran. Li sala 1957-da li bajarê Helebê Hemze Axa bi pêşgo-

tina xwe çap kir. Dû wê, li sala 1953-da li bajarê Hewlêrê edebyatnas û tarîxnasê kurd Gîvî Mukriyanî "Mem û Zîn" bi pêşgotina xwe û bi zaravê Soranî çapkir. Li nav salên 1932 1945 car-cara li kovara "Hawar"êda "Mem û Zîn" bi tîpêñ latînî hatine çapkirin.

Niwîskar M.B.Rûdenko "Mem û Zîn" li rex teksta zimanê kurdî tercuma wê bi zimanê rûsî nivîsî û di sala 1962-da li Moskovayê hat çapkirin.

Navê bavê A.Xanî Eylas e, ew ji qebîla xanîya ye. A.Xanî merovekî xwendewer, bîrwer, û zana bû. Ewî zimanê erebî, farisiû tirkî baş zanî bûn.

Binyata poêma A.Xanî "Mem û Zîn" çîroka miletê kurd e. Qenatê Kurdo dibêje: "Bi fikra min navê A.Xanî, qedir û qîmeta nivîsarê wî li ser nav û nivîsara Ferdewusî, Nîzamî û Rûstavêlî dikeve, çimkî ewî di poêma xwe de ne ku bi tenê qeremanî, dostî, biratî û evîniya rast û rasteqîn anîye ber çavan, ewî wisan ji pirsa bindestî, belengazî û hêşirîya miletê xwe anîye ber çavan û rê û dirb nîşan kîrine, bi çi teherî ji wî halî derkevin û azad bin..."

Ahmedê Xanî qedir û qîmeta zimanê kurdî baş zanî bû. ewî zanîbû, ku bona pêşveçûna û pêşketina miletê kurd, bona yekitîya qebîle û eşîrêñ kurdan, bona serxwebûna kurdan lazi-

me her kurd biçük û mezin zimanê dayika xwe
geleki baş bizanin,pê çirok,serpêhatî,beyt,
şêr,tarîxa xwe binîvîsin. ji ber vê yekê e-
wî bona zarokên kurdan medresak ji kîsê xwe
vekir û bi xwe dersên zimanê zikmaki dida
zarokan.Ewî ferhengek erebî-kurdî nivîsi,ku
bona zarok û mindalên kurdan bi zimanê xwe
bixwînin û baş hînî zimanê erebî bibin.Ewî
di vê derheqê de vusa nivîsiye:


"Ji paş hemd û selwetan,
Ew çend kilme ji luxetan,
Vêk êxistine Ahmedê Xanî,
Navê lê nûbara biçûkan danî,
Ne ji bo sahib rewecan,
Belkî ji bo biçukêd kurmancan,
Ku ew ji quranê xilas bin,
lazime sewad û çav nas bin."

Heta niha çar nivîsarên Ahmedê Xanî aşî-
karin.Navê wan evin: "Mem û Zîn","Nûbar" ,
"Eqîda imanê" û "Şêrên filozofî". Ji wan her
"Eqîda imanê" çap nebûye.Bi gotina zanyarê
kurd M.Emîn Bozarslan "Eqîda imanê" niha li
kitêpxana Stembolêdaye.

Celadet Bedirxan di nivîsara xwe da "Ki-
lasîkên Me" (Hawar,hej.9) dibêje:

"Di pey mirina A.Xanî şagirtê wî Smaîl
bîst salêن di wê dibîstanê da guhdar bû û
dersê kurmanciyê têda gotin".Ew dîsa dibêje:
"Li goratıştê min bihîstîye,Xanî kitêbeke

Di vî resmî de, seetek, qelemek, müzek, hambûr-
gerek û şewqak tê de vesartîye. Ma hun dika-
rin wan bibînin ?



MELE ^ TILBÊT

Melak diçe nava koçera û li malekê dibê mîvan.Xwedîyê malê navê wî tilbêt e.Tilbêt ji mele dipirse:

-Seyda ! Sehekî me hebû mirt,

Me eyarê wî jê çirt,

Me vê salê rûnê xwe têd girt,

Helale an herame ?

Melê lê vegerand û got:

-Herame,Tilbêt herame !!!

Tilbêt gazî pîreka xwe kir:

-Wa Gozê,wa Gozê

Bîne darê devê kozê

Da ez ji melê biweşînim tozê.

Mele li gotina xwe zû poşman bû û pîrsî:

-Ma te çi gotibû Tilbêt,min ji te fêm nekir...

Tilbêt gotinêñ xwe dîsa got:

-Seyda! Sehekî me hebû mirt,

Me eyarê wî jê çirt,

Me vê salê rûnê xwe têd girt,

Helale an heram e ?!

Mele lê vedigerîne:

-Helal e,ezbenî helal e.

Tilbêt gazî Gozê kir:

-Wa Gozê,wa Gozê,




Sawarekê ji mi û melê re çêke,

Ji wî rûnî lêke,

Neqeba min û melê ke...

DAYKA NEDİM

NAVEN WAN TIŞTANAN Lİ BİNE WAN BİNİVİSİN



PEYVEN PEŞİYAN

21 "Ne malê pirr, ne gerdena istûr!"

22 "Ewê ku dest kirîye, dê û bab nekirîye!"

23 "Mirovê sebrê, melîkê Misrê!"

24 "Çawân saq e, gore lîyaq e!"

25 "Dilê şîvan hebî, ji nêrî golemast çêdik-e!"

26 "Şam şekir e, wetan şîrîntir e!"


27 "Rê dibî bost, neyar nabî dost!"

28 "Lema dinya ava ye, her kes bi aqilê xwe şâ ye!"

29 "Aqîl tacâ zêrîn e, li serê her kesî nîne!"

30 "Nan bide nanopêjan, bila nanek zêde bî!"

DI NAV NEH RESMAN DE DUDU WEKHEVIN.
MA HUN DIKARIN WAN BIBININ?



QUNCIKA MUZİK É

Note nivîs: Cemîla Celîl

YAR LÊ ÇIMA 27.

Moderato

Yar lê çi - ma, çim çi - ma. Dost lê çi - ma.
war çi - ma, Yar lê çi - ma, war çi - ma.
Dost lê çi - ma, war çi - ma Ez h'elyam bû - me şî - ma.

Yar lê çima, çim çima.

Dost lê çima, war çima.

Yar lê çima, war çima.

Dost lê çima, war çima

Ez h'elyam bûme şima.

Yar lê çima, çim çima.

Dost lê çima, çim çima.

K'etime xîyalêd xema,

Qet gund ne got. çima

Ez h'elyam bûme şima.

Yar li ç'emê Gergerê.

Dêşin birinêd berê.

K'etime xîyalêd xema,

Qet gund ne got. çima

Ez h'elyam bûme şima.

Yar li ç'emê Erdîşê.


Xort dilizîn qayışê.

K'etim xîyalêd xema,

Qet gund ne got. çima

Ez h'elyam bûme şima.


DI NAV HERDU RESMAN DE PEC TIŞT NEWEKHEVIN.
MA HUN DIKARIN WAN BIBİNİN?




QUNCIKA BAJARÊN KURDISTANE

QEREKOSE (AGIRI)

NAV : Navê herî kevn Ararat e. Bajêr na-
vê xwe ji çiyayê tenist xwe girtîye. Paşî
derdora bajêr kete destê tirkâ, navê çiyê
kirin "Ağrı dağı". Li gor navê çiyê, navê
bajarê Qerekosê jî kirin AĞRI (sala 1926)



DIROK (TARİX): Dîroka Kerekosê dighêje
heta qraliya Urartû ya. Qerekose navendîya
qralîyeta wan bû. Piştî Urartû ya mintîqe
ket destê Tirkên ji navça Asyayê hatin. De-
meke kin herêm(mintîqe) ket destê împera-
torîya Eceman(Persian). Piştî İskenderê me-
zin li diji Eceman bi serket, mintîqe kete
destê Ermenîyan.



Qesra İshaq Paşa; Di nav xwe de du qat e û mizgeftek ji du hun-durê wê de ye.

Qerekose di dema Xelîfe Osman de kete destê Ereban. Demek dirêj Abbasîyan mintîqe talan kirin. Heta şerê di nav Osmanîyan û Eceman di sala 1514-anda İlhanîyan, Karakoyunan li vir hukumkir. Qerekose di sala 1578-anda bi tamamî kete nav axa Osmanîyan.

Bi dû şerê Osmanîyan û Ûrisan (1877-78) derdora Qerekosê kete nav axa Ûrisan. Di 15 Nîsanê sala 1921-da bi tevayî kete bin destê Tirka.

Wek gelek carê din kurdan li himberî vê bindestîyê jî seri hildan. Di sala 1927-





Xalîyek ji bajare QEREKOSE.

WAV HEJMARAN YEKO-YEKO BIGIHININ HEV



QUNCIKA

XEZIKA



P E Z A N I N

Pirs: 1

Him şil dike,
Him dîwar qul dike.
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 2

Oda şuştî-muştî,
Cotê qazan têda rûniştî.
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 3

Du xûşkê cînar,
Ji hevdu nakin bawer.
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 4

Tîşkî min heye tiştanok,
Diniya hemû têdaye.
Ew çîye ?

Bersîv:.....

NAVE VAN HEYWANAN Lİ BİNÉ WAN BİNİVİSİN





15	16		3	9
		20	21	2
1				25
24		6	12	18
	23	4		


XACEPIRS




2

1↓

2→




3→




1

6→



6



5


5→



5



4



3



7

QUNCIKA PÊZANÎN ^

Pirs: 1

Tişkî min heye tiştanok,
Kîskê kaba darda,
Deqê mini navda,
Ew çiye ?

Bersîv: .S.t.e.y.r.kê. e.z.m.a n a û hîv

Pirs: 2

Hêlva tê,kendêlva tê,
Porsorê hermêva tê,
Ew çiye ?

Bersîv: ..Tîrêncâ..tayê

Pirs: 3

Lezê,bezê
Wekî fesal heve,
Wê merîya vegevize.
Ew çiye ?


Bersîv: ..Ba.....

Pirs: 4

Tişkî min heye tiştanok,
Ji ar hûrtire,
Ji deve bilintire,
Ew çiye ?

Bersîv: ..Dû.....


X A Ç E P I R S



5



A
T
I
L




1



6



2



4


KEREKÎ ME HEBÛ Û KUNDURKÎ ME


KERÊ ME KUNDURÊ ME KOT KOT KOT,

ME JÎ ÇIROK Û MESELÊN XWE

YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERÊ GOT

KULILK





YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANE

ADRESS - NAVNIŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIORNR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA